# Name bo dêû bav û çavdêran li ser şerê l Rojhilata Navîn

Navê dibistanê
Name of school

Dêûbav û çavdêrên hêja

Li dibistana me em pirrengiya çandî ya civaka xwe ya dibistanê bi nirx dikin û hurmet û têgihiştina biryarên cihêreng û nêrînên cîhanê bi pêş dixin. Bi dijwarbûna vê dawiyê di şerê Rojhilata Navîn de, ez dixwazim we piştrast bikim ku dibistana me hewl dide hawîrdoreke ewle û piştevan ji xwendekar, karmend û malbatan re ji hemû paşxaneyan peyda bike.

Fikrên me bi her endamekî civaka me re ye ku dibe di bin bandora pevçûnê de ne.

Dilgiranî der barê pevçûnê de, dibe ku hest û derbirînên xurt ên dîtinên di navbera xwendekarên ku bandor li malbat an jî hevalên wan bûne an jî girêdana bi herêmê re derdixîne holê. Haya xebatkarên me ji vê heye û li hemberî hest û bersiva xwendekaran hesas in.
Ji kerema xwe piştrast bin ku her mijarên nîqaş, mijar an jî tevgerên xwendekaran ên ku dikarin di derbarê pevçûnê de bi awayekî adilane û bi baldarî bên birêvebirin. Şêwirmendî û piştgiriya tenduristiyê heye û xwendekarên ku bi xem in an jî xemgîn in, tên palpişt dikin ku bi şêwirmendê dibistanê an jî bi mamosteyên xwe re biaxivin.

Em ji we dixwazin ku hûn li malê bi zarokên xwe re li ser xemên ku di vê demê de hene biaxivin û bînin bîra wan ku dibistana me cihekî ewle ye ku hurmetê dide hemû mirovan. Heger ti xemên we hebin, ji kerema xwe bi dibistanê re bikevin têkiliyê da ku em bi hev re bixebitin ji bo hemû xwendekarên me xwe di ewlehîyê de hîs bikin û baş werin piştgirîkirin.

Heger pêdivîya we bi wergêrekî hebe, ji kerema xwe di 131 450 de li xizmeta Wergêrên Telîfonê bigerin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin. Ji opêratorê re hejmara telîfonê ya ku tu dixwazî bigerî bibêje û ji bo ku di axaftina we de alîkarîya we bikin dê wergêrekî li ser xetê bistînin.
Ev xizmet belaş e.

Ji bo piştgirîya we ya berdewam ji bo pêşvebirina hawîrdoreka hînbûnê ya erênî û hurmetdar ya li dibistana me, em spas dikin.

Li gel rêzê

Navê midûr
Name of principal